payîza 1981 –an, ji ber gelek pirs û sedeman nemaze (pêdiviya helbijartinan di nav rêxistina partiyê de li herêma Cizîrê – helwesta li beramber Komela Mirteda ya Cemîl Esed birayê serokê Sûriyê yê berê Hafiz Esed , hêrişa Mistefa şemran û Ayatulah xilxalî li dij Mahabadê û kuştina gelek kadroyên P.D.K-Îran - pirsa demokrasî û çêroka helbijartina perlemento li Sûriyê – pêdiviya serbixwebûna rêxistina partiyê li Ewropa …hwd), cudabûn dikeve El-partî, û partiya Kar a Demokrat a Kurd li Sûriyê tê holê, kar û barê birêvebirina vê partiya nû weke sekretêr heya 1990 –î bi Şêx Alî dihate hilpesartin . Dûv re, ligel hin baskên Tevger a Kurd li Sûriyê (1990 – 1993) nemaze ligel baskê El – partî (Xêza Kongira 1988) ya ku, bi serkêşiya Mamoste Îsmaîl Omer û Salih mile Silêman yekîtî tê avakirin, û ew dibe endamê komîta siyasî . Di herdu kongirên dawî ya parta Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (2001-2005) Îsmaîl Omer weke serok û Şêx Alî weke sekretêrê partiyê têne helbijartin û ligel endamên dî yên komîta serkirdayetiyê kar û barê partiyê birêve dibin .

*** Hûn weke yek ji berpirsiyarên P.Y.D.K.S, gelo sedema zêdebûna partiyên Kurd li Suriyê çi ye, di nêrîna te de sûda vê yekê li çareserkirina pirsa Kurd heye?**

Ev reng pirbûn û zêdebûna rêxistinên kurd li Sûriyê, sûdê li çareserkirina pirsa Kurd nake . Ji bilî vê yekê, ew kêm zêde, rê li ber xelkê kurd û raya gştî wenda dike, û rê dikeve serberdayetî û keysebaziyê .

Sedemên vê rewşa aloz û tevlihev bi heceyî lêveger û nirxandina qonaxên ku Tevgera Kurd tê re derbaz bûye de ye, bi hewceyî lêkolînên zanistî, diyalog û danistandinên berpirsyar, berfireh û aşkere ye . Gelo berjewendiya gelê kurd li Sûriyê çi ye ?...pêvajoya jiyana wî ya civakî, aborî û rewşenbîrî serûber di çi çerçewê de ye, û çendî bi civaka Sûrî ve girêdayî û di nêv hevd e ye ?. Ûli gor naskirina vê tabloyê, partiyeke kurd gerek çi bide berxwe, da ku, karibe bi cî bike, gavan bavêje û bi serkeve . Ev yeka he, dixuyê hê li ba gelekan ne zelal e, di hiş û seriyan de baş cî negirtiye . Eve sedema yekemîne ango dihêle tevgera kurd li Sûriyê di aloziyê de bijî, ji ber binale û rê li ber durişmên mezin û neberpirsiyar, siyasetên çewt û nexweşiyên ezîtiyê vebe .

Sedema dî ya herî sereke heyama – etmosfîra – siyasî li Sûriyê û pirojeyên rijîma dewletê li derbareyî gelê Kurd, tunebûna Alfebeya demokrasiyê ye . Eve bêtirî çel salî ye ku Sûriyê di bin bandora dadgehên awerte, Ehkam Urfiyê – siqi yonetim – û karbidestiya tekpartiyê de ye …lewre jiyana siyasî, rewşenbîrî û civakî ya civaka Sûriyê ser û ber di asteng û aloziyan de digevize . Bi ser de jî bandor û kartêkirina têkliyên hêzên Kurdistana Îraq û Tirkiyê bi rijîma Hafiz Esed re, bez û kelkela gelekan ji siyasetvanên Kurdên Sûrî ku xwe li ber wan reng têkliyan germ bikin û di nav gel de cî bigirin, bê ku xwe bibînin ku nûnertiya pirsa Kurd li Sûriyê dikin, û dadmendiya ev pirsa he, ne kêmî dadmendiya pirsa Kurd li Tirkiyê an Îraq û Îranê ye. Tevî.

⟶